# NEWROZ



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993

<u>Xebat ji bo :</u> *** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .**

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
*Email :* **Newroz95@hotmail.com**

| Hejmar(76) | Ç. Pêşîn | 2007 z-2619 k | Buha (15 ) p.s |
|---|---|---|---|


# Ji heftenameya Çawdêr re

***Rojnama Çawdêr hevpeyvînekê bi Sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ) Mihyedîn Şêx Alî re dike û li Silêmaniyê, di 12-11-2207 an de dewşêne.Eemê vê hevpeyvênê ji xwendevanê Nerozê re biweşênin:***

**1. Berhemên bizave neteweye kurd li rojavaye Kurdistan piştî kû 50 salîya xwe ya zêrîn derbas kir çîye...?**

**B1**- Piştî 50-salî ji temen û xebata tevgera siyasî a kurd li Sûriyê , mirov dikare van nirx û berhemên jêrî bîne ziman:

**a-** Li Sûriyê, nemaze li herêmên kurdax, kobanî û cizîrê, kurdan serûber xwe naskirine ku kurdin, li ser axa bavbapîran dijîn , zimanê dê bi wan buhaye , ew parastine û pê dipeyîvin , ango , hestê netewî baş ciyê xwe girtiye , zimanê dê di civaka kurdan de zimanê sereke ye.

**b-** Rola tevgerê di pêşkeftina civaka kurd di warê zanyarî û xwendina bilind de , roleke berçav û xurt bû.

**c-** Tevgerê karîbû li cejina Newrozê bibe xwedî , û îro roj , Newroz di tevahiya civaka Kurd û Ereban de li Sûriyê ciyê rêz û hurmetê ye .

**d-** Bi xêra tevgerê , bi sedan mamoste û nivîskarên bi zimanê dê hatine holê.

e-Gelek rewşenbîr û siyasetvanên Ereb dostaniya gelê kurd dikin û bi çavên erênî li pirs û daxwazên tevgerê dinêhêrin û dibine piştgir.

**e-** Rewş û pirsa kurd li Sûriyê li ba gelek hêz , rêxistin û komeleyên mafên mirovan hatiye dannasîn.

**2. Çire ta niha bizavê fişareke piraktîkî nexiste bo ser rijîma sûrîyê jibo danasîna nasnamê gelê kurd û çareserkirina pirsgirêka rewa…?**

**B2**- Rijîma Sûriyê dûrî Demokrasiyê ye , û eve 44-salin siyaseta yek-partî tête ajotin û serdest e , lewre jî çareserkirina pirsa kurd hê neketiye rojevê . kurd û ereb li Sûriyê di zikê hev de ne , rewş, jiyan û berjewendiyên wan ji hevdû cuda nabin , loma jî, çendî heyameke demokratîk li Sûriyê bête peydakirin, ewqas kurd li karê ne , û pirsa wan ya netewî nêzî çareseriyê dibe. ⟶

www.arsivakurdi.org

**3- Rewşa dawî ya bakûr û başûrê Kurdistan piştî geft û hereşeyên tirkan bo bezandina sinûrên başûrê Kurdistan çawa dinirxînin…?**

**B3-** Ne cara yekê ye ku karbedestên Turkiyê diltengî û çavsoriya xwe derbarey pêvajoya rewşa kurdistana Îraqê bi tundî didine xuyakirin . Hêja ye em bînin bîra xwe ku , hê dema lihevkirina 11-ey Avdarê sala 1970 di navbera Bexdê û kurdan de , karbedestên Turkiyê bi her hawî dixewstin ku ew lihevkirina beravîtî bibe . Mixabin dixuyê ku , eger li Hind û Çînê jî kurd bi nav bibin , xwedî cî û war bin, dîsa jî , li ba rayadarên dewleta Turk dê bibe girêk û serêş .

**4- Piştî serdana serok komarê sûrê beşar esed bo tirkîyê û piştgirîya wî ji tirkan re ji bo dagîrkirina başûr û lêdana pkk helwêsta partîya we çibo…?**

**B4-** Helwesta Sûriyê bi hêla piştgiriya Turkiyê bona derbazbûna Kurdistana Îraqê li ba Parta me ciyê nerazîbûn û şermezariyê ye .

**5- Aye raste kû mebesta tirkan çîyayê qandîle yan hindek armancên xwe yên nediyar hene…?**

**B5-** Dewleta Turkiyê di Rojhilata navîn de , dewleteke mezin , xwedî dezgeh û hêz e, di NATo de endam e , li Afxanistan û Libnanê xwedî rol e…Vêca wê razî nebe ku li Îraqê bê roleke berçav û xurt be – weke çawa Îran li başûrî Îraq xwedî destekî dirêj e – lewre jî Turkiyê dixwaze pirsa çekdarên PKK li çiyayê Qendîl û hinde kiryarên wan bike eger û perde, da ku , derbazî nav xaka Îraqê bibe. Ragihandin û propaganada Turk gelekî jîr e, û dikare tiştan ji nîskê bike gîsk, da ku raya giştî li Turkiyê û cîhanê li gor xwe bajo û rastiyan bervaja bike

**6- Tirk çend mehên burî geft û hereşeyên pir dijwar li dijî serokayetîyên başûrê Kurdistan dikirin jib o cibecî nekirina xala 140 ya kerkuk û piştgirîya enîya tirkmanî li dijî xelkên kurd dikirin û îro jî bi bihaneya kuştina 15 serbazên xwe li şernaxê kû 100 km dûrî sinûrên başûre li ser destên, gerîlayên pkk geftan dike ma gelo bi bîr û remanên we tirk çi dixwazin….?**

**B6-** Cîbecînekirina xala 140 bona Kerkûkê , daxwaz û hewildana gelek hêzan e , çi li hundir Îraqê û çi li derdorê , digel ku weke ez fêm dikim helwest û nêrîna Emrîkan û gelek hêzên dî derbarey pirsgirêka Kerkûkê, ne li gorî dilxwaziya kurda ye, ku xwedê giravî , Kerkûk jî weke Hewlêr û Silêmaniyê di çerçewa sînorên cografiya herêma Kurdistanê de be . Siyasetmedarên Anqerê vê yekê tê dighên, lewre jî Hukûmeta Anqerê şûrê xwe li ba dike û dixwaze hespê xwe bajo ser kurdên Îraqê . Di texmîna min de , dewleta turk neketiye kula mirin û jiyana çend memecik û serbazên ordiya xwe, ne jî kuştina leşkeran û kiryarên xwekujiyê , rê li ber çareserkirina pirsa kurd li turkiyê dûz dike.

**7- Erdoxan bang li pkk kir dest ji çekan berdin û werin perlemanê lê piştî kû pkk li ser daxwaza serokê herêma Kurdistan mesûd berzanî û serok komarê îraqê celal telebanî û emerîka pkk careke din agir best ji yek alî de ragehand belam reyadarên tirkan ew agirbeste nepejrandin aye ev pirsgirê kçawa D.R.(3)**

www.arsivakurdi.org

# Pîrozbahî…

## Vekirina beşê kurdî di malpera Ragihandina Şamê de Pîroz be!!

***Rêberê Silîvî**



Vekirina beşê kurdî di malpera fermî ya " **Ragihandina Şamê ji bo guhertina demokratîk** " de, gaveke hêja û balkêş e, ew ji bo ziman û çanda kurdî destkefteke pîroz e. Bi vebûna vî beşê ku ji hêla rewşenbîr, nivîskar, lêkolîner û helbestvanên kurd ve gerekê piştgirî û arîkariyê ye, dê çanda netewî ya giştî, çanda hemdem, çanda hezkirina mirov û mirovatiyê geş bibe û roniyê bibîne.

Tiştê mirov matmayî dihêle ewe ku destelata Sûriyê ji şûna ku piştgiriya ziman û çanda kurdî bike, rê li pêş geşbûna wî dûz bike, weke beşekî ji ji çanda netewî ya Sûriyê lê temaşe bike, bi her hawî ew xebitiye, hê jî dixebite ku vî zimanî biqurmiçîne, pûç bike, rehên wî ji singa gelê me hilqetîne, wî ji hole rake û zimanê Erebî bi dare zorê li şûna wî cîwarbike..!!

Lê, tîrêjên çanda mirovatî û mafên mirovan li seranserî cîhanê hêdî hêdî, vê nerîna çewta ne mirovane dide ber xwe û ji cîhana mirovatiyê bidûr dixîne, îro nivîskar, rewşenbîr û siyasetvanên hişmend ên Ereb, Asûr, Ermen…û ên dîtir, têgihane ku kuştina zimanekî netewî, kuştina beşekî ji çand û wêjeya netewî ya Sûriyê ye!..

Bera li ser xaka welatê me Sûriyê, ziman û çanda hemî gel û kêmnetewyên sûrî li kêleka hev bi aştî û biratî bijîn, hemî geş bibin û pêşve herin, çanda netewî şax vede û hemereng bibe, bibe cihê serbilindî û serfiraziya me hemiyan.

Bi hêvî û omîd im ku rewşenbîr, nivîskar û helbestvanên me yên kurd, bi pênûs û berhemên xwe yên delal vî beşê nûhatî dewlemend û zengîn bikin, ala azadî, aştî û wekheviyê bilind bikin.Serketin û serfiraziyê ji karê we yê pîroz re dixwazim. **Qamişlo**

---

**Dumahî: Ji heftenameya… çareserdibêt…?**

**B7-** Ew banga Erdogan zor erênî û baş bû , eger karîba lê biba xwedî, û li gorî naveroka wê bangê, siyseta hukûmeta xwe bida meşandin . Li hêla dî, çêroka ku (li ser daxwazan) şer raweste , agirbest be, anjî (li ser daxwezan) şer nû bibe û agir gur be, li ba mirov ne zelal e û baş fêm na be. Di baweriya min de, duh jî, evro jî, çendî ji alî kurdan ve agirbest bidome , û heyameke aştiyane li saz be , ewqas rê li ber çareserkirina pirsgirêkan vedibe. Û çendî kuştin û şerê xwînî li dar be, ewqas girêk mezin dibin , derd û kul pirtir dibin , bar û metirsî girantir dibin …Rê jî dikeve sergermî û bazirganiya bi pirsa kurd û pêşeroja Turkiyê û herêma Kurdistana Îraqê.

**8- Eger axiftinên we cuda hebin yan bangewazîyên we jib o raya giştî Kurdistan bi fermon…**

**B8-** Dixwazim bêjim em gelekî bi hewcey lêkolînên zanistî û ekadimîk in , da ku em xwe û derdorên xwe baştir nas bikin , ji ber ku, bi rastî jî, pirsa gelê me yê kurd çi li vir, çi li wir, pirseka mezin e , ji partiyan û serokan mestir e, û em bivên nevên, çareserkirina vê pirsa netewî, ya dadmend û mirovane , wê di çerçewa rêzgirtina sînorên navdewletî yên heyî de serê xwe bibîne . Dem hatiye guhartin û bi lez dibore.

Sipas ji xwedî û karmendên Çawdêr re.

2-11-2007an

Sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê.

**Birayê we**
**Mihyedîn Şêx Alî**

www.arsivakurd.org

# Azadî ji mafê nerîn û derbirînê re !
# Azadî ji pênûsa azad re !
# Bang

Beriya derdora 8 mehan, rojnamevan **Ednan Hesenpûr** û çalakvanê sivîl **Ebdulwahid Bûtîmar**(Hîwa) ji bal desthilata Îranê ve li bajarê SINE hatin zindankirin. Li roja 18.07.2007an, dadgeha Islamî biryara bidarvekirina herdu rewşenbîr û xebatkarên kurd wergirtiye û ew di zindna tekane de cîwar kirine.

Bi rastî, şerm û fihêt e ku di demeke mîna dema me ya îro de mirov di welatê xwe de, ji bo nerîn û helwesta xwe ya azad bête bidarvekirin..!!

Li gora hemî zagonên navnetewî û prensîpên mafên mirovan di cîhanê de, mafê nerîn û derbirînê mafekî parastî ye, nabe tu dewlet, tu hêz vî mafî binpê bike û li gora berjewendiyên xwe yên tengî nijadperest vî mafê pîroz daqurtîne.

Em kovar û weşanên bi zimanê kurdî yên li Sûriyê derdikevin, vê biryara hovane ya derheqa herdu rewşenbîr û tekoşerên kurd şermezar û riswa dikin, bang li hemî dezgehên mafên mirovan, raya giştî ya cîhanê, hezkerên azadiya mirovan, hezkerên peyva azad dikin ku li dijî vê biryara ne mirovane serî hildin û ji bo serbestkirina wan têbikoşin.

- Azadî ji mafê nerîn û derbirînê re!
- Hilatina terorkirin û işkencekirina rewşenbîr û xebatkarên mafên mirovan ji cîhanê..!

Sûriya : 31.08.2007

* Kovara Aso
* Weşana Deng
* Kovara Gulistan
* Kovara Gelawêj
* Kovara Jîn
* Weşana Newroz
* Kovara Pirs
* Kovara Perwan
* Kovara Roj
* Kovara Vîn
*WeşanaZiman

**Dumahîk: hevpeyvîn bi nvîskar....**

P7- Çima wê asteng ji aliyê dewletê ve bêne pêşiya te?

B7-tiştin hene ezê nikaribim ser wan ve derbas bibim wek **(Dêrsim, Aleqemş, kuştina yawûz Selîm ji kurdan re, Helebçe, zêwe, serhildana Qamişlo**.....h.t.d).ev yek wê li ba dewletê bibe ciyê pirsê.

P8- Tu çi li ser kurdên sûriyê dizanî?

B8-bi rastî tu têkiliyên min bi wan re tune ne, ez liser wan nizanim. Lê belê ez dibihîzim ku di aliyê zimanê kurdî de li pêş in, di warê çand û hunerê de jî wilo ne, lê ew çi kar û xebatê dikin ez li ser wan nizanim .Sedema wê jî ewe ku ez bi zimanê kurdî nizanim .



P9-Tu çi ji xwendevanên Newrozê re di bêjî?

B9- Hîn min ev weşan ne xwendiye, lê bêgoman, tiştekî gelekî pêwîst û balkêş e ku weşanek wek wê di nav kurdên sûriyê de û bi zimanê dê, bête weşandin .Bi hêvî me ku di rojên bên de, win arîkariya min di komkirina agahiyên bi kurdên sûriyê ve girêdayî bikin, da ku wî projeyê min dayî xuyakirin pêşde bibim.

P10- Gotina te ya dawî?

B10-sipasiya min ji we re bê sînor e,li ba min tuştekî gelek pêwîst bû ku dengê min bighe kurdên sûriyê, hêviya serkeftinê ji weşana (NEWROZ)ê re dikim, bi hêvî me ew di asmanê çand û rojnamegeriya kurdî de bibe çirake bi ronak.

Yê bi karê wergerê rabû: **Adnan Akyûz**

Diyarbekir8-9-2007

www.arsivakurdi.org

# Ahenga bîranîna Seydayê Cegerxwîn Li Qamişlo hate lidarxistin

**Bi** helkeftina 23 yemîn salvegera koçkirina Seydayê **CEGERXWÎN**, Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê, ahengeke rewşenbîrî, êvara 22.10.007 an, li ser gora nemir **CEGERXWÎN** li bajarê **Qamişlo** li dar xist.

Bi beşdarbûna dora 200 kesî ji rewşenbîr, çalakvan, welatparêz û navdarên kurd, demjimêr 18:45 bi rawestana kêlîkeke bê dengî li ser giyanê helbestvanê me yê gewre Seydayê **Cegerxwîn,** ahengê destpê kir.

Di nerîna me Kovarên Kurdî Li Sûriyê de, tevî hin kêmasiyên derbasbûyî, şev bi rengekî xweş û serkeftî bi dawî hat. Kêmasiya serke ew bû ku hin ji helbestvan û rewşenbîrên me yên giranbuha derfeta xwendina berhemên xwe ji ber tengbûna demê nedîtin, ewa ku li ba me cîgehê mixabinî û hêviya lêborînê ye.



Xala din a cîgehê balkêşî û şanaziya me ye ewe ku ev karê me yê hevbeş, rêzgirtin û rûmeteke taybet û berbiçav li nik rewşenbîrên me yên xoşewîst dibîne. Di vî warî de, em hêvîdar in ku di paşerojê de, ji bo pêşvebirin û geşkirina rewşenbîriya kurdî li Sûriyê, em ê di asteya hêvî û baweriyên wan de bin.

Li dawiyê, em sipasiya hemî beşdaran dikin, û ji bo kêmasiyan, careke din lêborînê dixwazin.

**Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê**
**26.10.2007**

## Gotina Kovarên Kurdî Li Sûriyê Di bîranîna 23 saliya koçkirina Seydayê Cegerxwîn de

Di bîranîna 23 saliya koçkirina Seydayê Cegerxwîn de, em bi navê kovarên kurdî yên li Sûriyê têne weşandin (**Aso, Pirs, Gulîstan, Deng, Gelawêj, Newroz, Perwan, Roj, Jîn, Vîn, Ziman**) û bi navê hemî piştgirên ziman û wêjeya kurdî, vê bîranînê bi bîr tînin û xêrhatina we dikin.

Bi helkaftina vê bîranînê ku 23 sal di ser koçkirina Seyda Cegerxwîn re derbas bûne, em bîst û sê gulên rengîn diyarî gorna wî dikin, bîst û sê bîranînên din em bi hev re bixemilînin û di bin siya mijankên rist û helbestên wî de, tevna rewşenbîriyê li dar xînin, bîst û sê singan ji pênûsa qederê li ser sînga kaxezan biçikînin, nemaze, pevhûnandina helbestvan, rewşenbîr, siyasetmedar bi hev re di yek qelafetî de, sira hênik in, yadîgar in, evra ne, her di nerîn û rewşa xwe de zindî ne.

Bi navê prensîpên mirovatî, zagon û yasayên mafnasiyê û rewatiya navnetewî, bi navê rewşnebîrên ku roleke ronak dilîzin û çavên wan li ser dîmenê xwerista zemînê dikutkutin û piştgiriyê didin geşbûna zimên û çelengiya şeng, **D.R.(10)**

www.arsivakurdi.org

# Hevpeyvîn bi nivîskar û hunermendê Kurd

**Lwend Ozkan re**

**Lewend Ozkan,** yek ji nivîskar û hunermendên kurd e, li kurdistana bakur dijî wêney, li **Diyardekrê** ez rastî vî hunermendî hatim , piştî naskirina me ji hevre, min jê xwest ku hevpeyvînekê pêre bikim , yekser wî erê kir.

Mamoste **LEWND OZKAN** bi navê weşana NEWROZ ya du mehane , ji bal Partiya Yekîtiya Demoqrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ) ve tê weşandin ,em bixêrhatina te dikin , gelekî kêfxweş in ku te bi xwendevanên xwe bidin naskirin.



**P1-** xwezî mamoste tu xwe ji xwendevanên **NEWROZÊ** re bidî naskrin.

***B 1****-navê min* ***Lewend Ozkan*** *e ji* ***ALAZÎZÊ*** *me , min xwendina xwe ya yonîvêrsîta beşê (birêvebiriya karan) , ji zanîngeha ANQERê, wergirtiye.*

**P 2-** Tu di çi beşî de kar dikî?

***B 2*** *-Di beşê karîkatorê de min karkiriye, min hin wêne çêkirine , û çend pêşengeh li darxistine , li ser zarokên ku jiyana xwe di sikakan de dibuhirînin û li ser zîndanê jî min karîkator çêkirine , û di belavok û weşanan de min belavkirine, ya din pirtûkek min heye , xêzeromane, bi navê (MIRINA JARO) , min ew jî belavkiriye.*

**P 3-** tu di karî ji me re li ser vê pirtûkê hinekî bi axivî ?

***B 3****- ev çîroka sê pêlewanên kurd e, yek ji wan* ***Jaro*** *ye, naxwaze jiyan bi dawî be û dixwaze jiyanek bê dawî peydabike, ji Cizîra Bota derdikeve û berê xwe dide rojê , û piştî gelek berxwedana li dawî Jaro jî dimire. Ez bi hêvî me ku ev pirtûk ciyê razîbûna xwendevanên kurda be.*

**P 4-** ji bilî vê çi , çi berhemên we yên din hene ?

***B 4****- niha ez pirtûkekê ji 7 ta 10 cildan amade dikim, têde ezê li ser şaristaniya kurdan li* ***Zagrosê*** *û* ***dewlata Mîdya*** *şirove bikim, ezê qehremanekî kurd ji wir rakim û ezê wî bi dîrokê re bi rêkim, herweha ezê bidime xuyakirin ka bê çi bi serê wan dihat , weke roman, ezê têde li ser cil , gerdiş , kultûr , cigrafiya Kurdistanê û bûyerên ku bi wan re derbas dibûn di her demekê de bînim zimên.*

**P 5-** Ji bopêkanîna vî projeyî te têkilî bi kesekî re kiriye?

***B 5****- hîn ez di herema Kurdistana Tirkiyê de me ,ezê ji kurdên Sûriy, Îraq û Îranê jî arîkariyê bixwazim û agahiyan ji wan wergirim, ji ber ev proje ne li ser parçekî bi tenê ye, lê belê li ser tevaya Kurdistanê ye, weke min berî niha da xuyakirin, ji kevin de ta roja îro.*

**P 6-** Çi asteng di pêşiya vî projî de hene ?

***B 6****- ji aloziyên ku têne pêşiya min ev in:*

***A-*** *deverê ku ez agahiyên xwe jê werbigirim, bela- wela ne.*

***B-*** *Bi tena xwe ez bi vî karî dirabim, ez hewcedarî arîkariyê me.*

***C-*** *Rewşa aborî. Wê astengin ji aliyê dewletê jî li jî li pêşiya min hebin*

**D .R ( 4)**

www.arsivakurdi.org

# Sersaxî

**Bi** navê kovar,nivîser û xwênerên wan,bi navê hemî rewşenbîrên Kurd li Binxetê,em sersaxî û serxweşiya malî,malbat,dost,heval,dezgehên rewşenbîrî û rewşenbîriya Kurd li welêt û dervî welêt,bi koçkirina dawî ya rewşenbîr û romannivîsê Kurd,nemir Mihemed Uzun,dikin.

Ji ber ku nemir Mihemed Uzun kuldarê çareserkirina pirsa gelê xwe bû, beşekî mezin ji jiyana xwe di ber gelê xwe û pirsa wî de terxan kir. Hewil da,ku gelê xwe serfiraz, di ristika gelên cîhanê de cihgirtî , bibîne.Loma,di gelefeka jiyanê de,nemir Mihemed Uzun, berê xwe da çand û hunera Kurdî,da wê mijara nasnameyî,ya ku di riya wê re dikare gelê xwe bi gelên cîhanê bide nasîn ,bike karê xwe yê sereke.Ew karê,ku roj bi roj şûna xwe, bi banbilindî ,di toteya navnetewî de digirt û dibû neynika dêrîniya gelê Kurd.

Hêviya me ji xwedanê jorî ew e,ku nemir Mihemed Uzun bi dilovaniya xwe şa bike ,di buhuştê de bihêwirîne û kulên ku bi şûn xwe de hiştin bi cih bîne.

***Kovar û rewşenbîrên Kurd li Sûriyê**
*** Kovara Aso**
*** Weşana Deng**
*** Kovara Gulistan**
*** Kovara Gelawêj**
*** Kovara Jîn**
*** Weşana Newroz**
*** Kovara Pirs**
*** Kovara Perwan**
*** Kovara Vîn**
*** Kovara Roj**
*** Weşana Ziman**



***Komîta çalakiyên Kurdewarî Qamişlo**
**11.10.2007**

****************************************************************************

**Di**18-10-2007 an de. Li ser riya bajarokê Şiyê, di bûyereke tiranfêlê de, xortê hetdesalî, Baran kurê mamoste Mihemed Delî jiyana xwe ji dest da. Roja dî, bi beşdariya xwedî, dost û hogiran, li gorstana bajarokê Şiyê tê veşartn. Li ser gornê, xewndekarek gotinekê , bi zimanê dê pêşkêş dike.



***Silav û rêz ji xwediyên rehmet, gundiyên Şiyê û ji beşdarên li sre vê goristanê re….***

Îro rojeke reş û tarî ye ji me tevan re , îro xemgîniyek pir giran bi ser me de hatiye , îro qederê perdeyeke reş di ser me re girtiye , ji ber ku , xortê me yê hêja û li ber dilên me tevan buha , ewê weke guleke rengîn ji gulên buhara şiyê û kurdaxa dil bi şewat . Xwendekarê pola yazdan , di buhara temenê xwe de , ***BARAN DILî*** , bi bûyerek kambax û giran , li ser riya bajaroka Şiyê , qederê nav me bir û destên me wî ji hev qetandin .

Baranê çardesalî yê hêja û delal , tu xortekî nûgîhayî , jîr , hişmend , di xwendina xwe de jêhatî û nû bi temen û jiyana xwe şadibû , tu ziyante negihîştibû tu kesî , lê barkirina te bi vî rengî û div î temenî de , dilêş û ziyana metevane .

## *Birayê hêja ….*

Xişma te ne bes xişma xwedî merivû gundiyên te ye , ew xişma me hemiyane û bi taybetî ya xwendekar û xortên kurde

Bi dilekî xemgîn û çavên ziwa , bi navê xwendekarên kurd li Helebê em serê xwedî meriv û gundiyên Şiyê sax dikin . Sebir û aramiyekê ji dê û bavê re dixwazin . Û buhişta firdosê jêre hêvî dikin ***Xwendekarên Heleb.***

Di dûre, apê Baran, bi navê malbatê, bi devikî sipasiya beşdaran dike û dibêje "Xweda tu teliyan negêne we .. serê we tevan sax be".

Bi navê karmend û xwendevanên Newrozê, em serê xwedî û hemû xwendekaran sax dikin

www.arsivakurd.org

# Goçbarkirina Mihemed Uzun

**Reşoyê Pîrê**

Mihemed Uzun li bajarê Siwêrekê, sala 1953 ji dayîk dibe. M. Uzun, di zaroktiya xwe de, bi bajarê Amedê û gondên derdoa wê re têkildar dibe, lewrejî, hukariya kurdayetiyê lê kiribû. Piştî darbeya eskerî ya 12-ê Avdara 1971an, ew jî li Amedê li gel welatperwer û şoreşgêrên Kurd tê zîndan kirin û 8 sal ceza danê. Di sala 1974 an de, ji zîndanê tê berdan. Di sala 1976 an de, kovareke bi zimanê Kurdî û Tirkî, bi navê RIZGARÎ belav dike.Û dibêji ku, " Rojnemaevaniya min bi kovara Rizgarî re dest pê dike". Di beşê Kurdî de, giraniya xwe dida çand û edebiyeta Kurdî.

Di sala 1977 an de, berê xwe dide dûriyê, li Siwêdê bi cî û war dibe. Li wir birêvebiriya çend kovarên Kurdî-Siwêdî dike.. Ji sala 1985 an û pê ve, dest bi nivîskariya edebî dike . Berhema xwe ya yekem, romana **TU** , di sala 1985 an de,. Li Siwêdê diweşîne. Di dûre, pir roman û xebatên edebî dweşanîne.

Ji ber hedu brhemên wî " **Ronî mîna evînê, Tarî mîma mirinê" û " Kulîkên Henarê**", di sala 2001 an de, Pêşkêşî dadgeha ewlekariyê li Stembolê dibe. .

Berhemên M. Uzun, bi pir zimanan " Siwêdî, Almanî. Norwejî, Înglîzî, Tirkî û hin zimanên dî hatine werger û weşandin.

Mehemed Uzun di yekîtiya nivîskarên Swêdê û di dûre, di yekîtiya rojnemevanên Siwêdî û dezgeha navnetewî a Yekîtiya rojnemevanan de cî digre.

M. Uzun, di sala 2006 an de, bi nexweşiya qanserê dikeve, li Swêdê û dewletên Yekbûyî yên Emekîka tê dermankirin. Lê mixabin bê care ye. Jê re dibêjin ku, çend rojên te mane. Biryara xwe distîne û di 13-6-2006 an de, vedigere Amedê. Li Amedê tê dermankirin û rewşa wî baş dibe. Lê sedcar mixabin, di 11-10-2007 an de, jiyana xwe ji dest da. Bi beşdariya deh hezar kes û bi dirûşmên " H**evrêyê rojê bê mirin e, Gelê Kurd bi te serbilind e û Şehîd namirin**", li goristana deriyê Mêrdînê ya Amedê tê veşartin

Li gorî wesiyeta wî, li ser gorê, nivîskarê bi nav û deng, Yaşar Kemal, serokê koma DTPê Ehmed Turk, serokê KADEPê Şerefedîn Alcî axivîn.

***Y. Kemal*** : " **M.Uzun, ji nifşê Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran û Evdalê Zênikê ye . Her li dijê şer derketiye. Ev şer dê di nêz de biqede" Memed romana Kurdî nivêsand. Ez di koka xwe de Kurd im, lê ne nivîskarê Kurd i m . Mihemed jib o zimanê Kurdî riya bistirî vekir**. Bi **qasîzimanêdayika xew, hênêtirkêjê bû. Herdu zimanên gelankir çavkanê**" .

***Ş. Alcî*** : " **Ew gula Kurda ye…..Mihemed ji gelê xwe re ronahiyek bû….Miheded di nav êşan de jiya. Di girtîgeh û zênana de ma. Derbarê wî de gelek doz vebûn..Li welatê xwe hate sirgûnkirin….Mihemed bi awakî fîzîkî ji nav me barkir,ew di dilê me de ye".**

***Emed Turk***: " **Mihemed deng û wijdanê gel bû….Di rêwîtiya xwe ya dawî de, xwest ku, ez, Yaşar Kemal û Şerefedîn Alçî li vir biaxivin. A rast axaftina me ne girîng e. Wî Peyama fikrên me cihê bin jî hatin cem hev. Diyalog girêdana bi hev re da. Daxwaza wî ketina nav diyalogê ya me bû"**

**Li dawiyê, Stranvanç, strana " Dayê dayê" yak o li ser gora Ehmed Kaya gotibdaran re pêşkêşkir.**

**komêta rêvebir ya weşana Newrozê sere xwedî û hemî zimanhezan saxdike.**

www.arsivakurd.org

# Silav li giyanê Uzun

Dîlan Zivingî

Weke tê zanîn ku , mirin hertim mirin e , eger bi çi rengî û li kîjan deverê dibe bila bibe , tenê mirin heye bi çûk û bêdengî derbas dibe , û mirin jî heye bi êş , keser , hesret û valahiyeke mezin li şûn xwe dihêle ! vêca jî , nûça mirina rewşenbîr û nivîskarê mezin Mihemed Uzun bi êş û jan belav dibû , dûr , nêzîk , çûk û mezin tev berketiyên wî bûn , heyf û mixabin ku , mamoste Uzun di nîvê temenê xwe de , di -11-10-2007- an li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da. Bêgûman mirina kesên mina mamoste û nivîskarê mezin ziyaneke pir mezin ji miletê kurd re ye , ma kî nizane ku , mamoste Uzun lehengê romana kurdî ye wisan jî,wî ji bo armanc û çanda kurdî li beramberî çiqas sal cefa û meşexte dîtiye .Lê tu carî, ji ya xwe nemaye hêvî , armanc ,êş û serpêhatiyên gelê kurd di riya berhemên xwe re dengê xwe bilind kiriye , wisan jî ew nivîskarê mezin û hêja ku, bi pir zimanan berhemên xwe weke sermiyan ji me re hêştine , lewre jî , em tev îro deyndarê wî ne . Pêwîste ku , em bi kurtahî jiyana nivîskarê zindî ji xwendevanên hêja re diyar bikin : Mehemed Uzun di sala -1953-an de li Sêwregê li kudistana Tirkiyê hatî dinê , di sala -1977-an de çû Swêdê, wî berhemên xwe bi kurdî , Tirkî û Swêdî nivîsandine . Uzun rêvabriya Yekîtiya Nivîskarên swêdê kiriye , û di pena Navneteweyî de xebitye, Endamtiya Yekîtiya Rojnamegerên Swêdê û Dinyayê kiriye . Nivîsên wî li gelek cihan hatine weşandin .

Li ser berhemên wî " Ronî Mîna Evînê , Tarî Mîna Mirinê "û "Nar çîçeklerî" [ kulîlkên Hinarê] di bihara 2001ê de li Dadgeha Ewlekariyê ya dwleta Stenbolê derbare wî de doz vebû, lê di dawiyê de berat kir . Di heman sale de xelata Yekîtiya Weşangerên Tirkiyeyê ya Azadiya Ramanê girt. Ji bilî vê xelata edebiyatê ya Enstîtuya Weşangerên Tirkiyeyê ya Azadiyê Torgny Segerste ditû .Di sala 2002yan de jî xelata Akademiya Swêdê ya bi navê Stîna –Erik Ludreberg wergirtî .

Uzun di sala 2006an de, bi nexweşiya qansêrê hesiye .Li Swêdê, li dewletên Yekbûyî yên Amarîkayê [DYA] hat dermankirin lê fêde sûd neda , encama wê yekê di 13.6.an 2006an de berê xwe dide Amedê û li 11.10.2007an dice dilovaniya xwedê . Hin ji brhemên wî evên jêrî ne :

-Tu Roman ,1985an. - Mirina kalekî Rind , Roman , 1987 . - Siya Evînê , Roman , 1989 . -Rojek ji rojên Evdalê Zeynikê ,Roman , 1991. - Despêka Edebiyata kurdî , Lêkolîn , 1992. - Mirina Egîdekî , Helbest,1993 –Hêz û bedewiyeta pênûsê , cerbandin, 1993. -Bîra Qederê Roman , 1995. –Ziman û Roman, Hevpeyvîn , 1997- Bir Dil Yaratmak Hevpeyvîn –bi Tirkî , 1997 –Hawara Dîcleyê , Roman , 2001 . û h.w.d .

Li dawî, dixwazim ji xwendevanan re bibêjim ku, bêgûman nivîskarê mezin û hêja Mihemed Uzun, ewê her û her di hiş û dilan de zindî bimîne , û bila serê hemû xwedî, meriv ,dost, heval,û gelê kurd tev saxbe , hêvî û armancên me ji berketiyên wî ew e ku zariyên mamostê mezin Mihemed Uzun li ser riya bavê perwerde bimînin

www.arsivakurd.org

**Dumahîk**: **Ahenga bîranîna** pêwendiyekê di navbera bergehên beşdarbûyî de bi mebesta xwendineke lihevhatin û li hevbanînê û hêviya avakirina dezgeheke rewşenbîrî, da ku karekî hevbeşî demokratîk di kultûr û kelepûreke hevgirtî de bikar bînin û em karibin derbarê projeya standarkirina zimanê kurdî û bi globalîzmê ve girê bidin.

Bêgoman, Cegerxwîn mizgîniya projeyeke spehî ji me re diyar kiribû dema gotiye: ne pir maye kurê min Cegerxwîn hunê
serbest bibin mizgîn û mizgîn
Çi tiştên ku baş bin bixwînin timî welatê me ronî dikin ew hemî

Diyar e ku Seyda li gorî derfetên xwe car cara, pêngavên bê hejmar avêtine û berhemên yekta afirandine û bi mereqa dîtina serbestiya çeleng hatine.

Seyda bi temtêlê civaka xwe û evîn û heskirina dîmenên welatê xwe ber bi sînorê nûjeniyê û banbilindiyeke mirovane û şaristanî ve çûye. Bi vî awayî, em dibînin ku rewanbêjî pêwistî xweşikbûn û gotinê ye, pêwistî avakirina hevgirtin û heskirinê ye, ev bîr û bawerî li nik miletê me û li ba kovar, nivîskar, çalakvan û rewşenbîrên me bibe dergûşa biratiyê û her ala rêveçûna jiyaneke aştiyane, wekhevî, hevparî, xwegirtî bilind bimîne.

Li dawiyê, em sipasiya herkesê beşdar ji bo vê bîranînê dikin.

**Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê**

Lêkolînek ji bal rêzdar **Derwêşê Derwêş** ve li ser jînengeriya Seyda, û yek ji bal rêzdar **Rezoyê Osê** ve, û yek ji bal rêzdar **Xalis Misewr** ve di ahengê de hatin xwendin. Birûskek ji malbata Cegerxwîn ji bal **Kesrayê Cegerxwîn** ve hate xwendin, û helbestvanê kurd **Arjen Arî,** ku ji **Amedê** beşdarî ahengê bûbû, gotineke devkî li ser hin bîranên xwe digel seydayê nemir pêşkêşî beşdaran kir.Gotineke devkî ji mamoste **Deham Ebdulfetah** ku hin têbîn li ser dîrokzanî û zimanzaniya seyda anîn zimên. Herweha, gelek helbest, birûsk di şevê de hatin xwendin.
Helbestvanên ku derfet ji bo xwendina helbestên xwe dîtin ev bûn:Rêzdar Xelîl Sasonî, rêzdar Salihê Heydo, rêzdar Bêwar Ibrahêm, rêzdar Narîn Umer, rêzdar Hozanê Girkundê, rêzdar Hîmen Mendanî. Li dawiyê, rêzdar Salihê Silo helbesteke Seyda bi dengê xwe pêşkêşî beşdaran kir



www.arsivakurdi.org

**Dumahîk** : **15 e mîn**

. xwe ya bi navnîşana(Stêrka Edebiyatê-Mîzah) de, li ser bersivên **Apê Mûsa** wiha dibêje: " *Yek ji meseleyên **Apê Mûsa** eve: Sala 1965 sn, **Apê Mûsa** li Mêrdînê dibe namzetê mebûstiyê, piştî demekê din, waliyê Mêrdînê gazî **Apê Mûsa** dike, piştî tehdîdan, walî ê re dibêje : di propagandaya hilbijartinê de kurdperweriyê neke**!. Apê Mûsa** jî bi şêwazeke îronîk (qerf) wiha bersiv dide: Walî beg, ji xwe ji bo ku ez di meclîsa Enqereyê de kurdperweriyê bikim dibim mebûs!!...".*

Herweha di vî warî de, nivîskar **Seîdê Sîsî** di gotara xwe ya bi navnîşana "Bîranînên Mûsa Anter" de dibêje:" *Di dadgeha leşkeriyê de, serdozger îdîa kir ku 8000 peyv di ferhenga kurdî de hene, ji van hin tirkî, hin erebî û hin farisî ne, lê, çel peyv hene ku serkaniya wan ne kifş e û dibêjin ev çel peyv kurdî ne. Çawa zimanek kare bi çel peyvan were mehderê*?!!". Wî bersiva serdozgerbi vî awayî dabû ku " *îro, mirîşka min jî dikare bi çel peyvên kurdî çêran ji serdozger re bihejmêre!..*".

Di sala 1994 an de, **Abdulkadir Ayganê** ku endamê **JÎTEM** ê bû li xwe mikur hat bê çilo û çawa wan **Apê Mûsa Anter** kuştiye. Mehkemeya mafên mirovan ya Ewropayê li ser doza **Apê Mûsa** dixebite, ji bo dewleta tirk vê dozê bincil bike û xwe jê xilas bike, sala 2005 an, xwest lihevhatinekê bi malbata **Apê Mûsa** re bike û 15000 Uro bide wan da ku vê dozê bigre, lê kurê wî rêzdar **Dicle** dibêje:" *em tiştekî wiha qebûl nakin, çênabe dewleta tirkan pereyan bide û ev doz bê tefandin, divê cinayet bê zelalkirin û kesên sûcdar cezayê xwe bibînin*".

Di 15 e mîn salvegera vê bûyera dilêş û xemgîn de, em şehîdê xwe yê giranbuha di bîra xwe tînin, gurzek gulên rengîn li ser gora wî datînin û jê re dibêjin, raze bi xweşî ey şehîd, vaye îro ew zeviya ku we bi xwêdan û xwîna dilê xwe av dabû îro pişkivî û pel vedaye, bi dehê hizaran keç û lawên gelê te li seranserî welêt bi zimanê dayika xwe dixwînin û dinvîsin, ew kurdperweriya ku we ji bo wê canê xwe yê şêrîn daye roj bi roj li nik keç û lawên te bilind dibe û fidakarî ji bo wê li her cih û warî dibe…Raze bi xweşî mamosteyê şehîd, gelê te tu carî xebatkar û rewşenbîrên mîna te ji bîr nake, her tu di dil û hişê me de sax î …!!

**Qamişlo**
20/09/2007

**Jêder:**

-----------------------------------------

1-Gotara nivîskar **Hesen Deniz**
2- Gotar nivîskar **Seîdê Sîsî**
3- Gotara nivîskar **Evdile Koçer**
4- Malpera **wikipedia.org**



www.arsivakurdi.org

# 15 e mîn salvegera Şehîdbûna Mûsa Anter

***Rêberê Silîvî**

Sala 1918 an, li gundê **Zivingê**, navçeya **Nisêbînê** li bakurê kurdistanê, **Mûsa Anter** ji dayik dibe, xwendina xwe ya seretayî li **Mêrdînê,** ya navendî û lîse li **Adanayê** diqedîne. Sala 1941 ê, ji bo xwendinê, berê xwe dide **Sitenbolê**, fakulta maf(hiqûqê) diqedîne. Di sala 1944 an de, keçeke kurd ji xwe re tîne, du kur û keçek ji wan re çêdibin, wan bi **Anter, Dicle** û **Rewşen** bi nav dikin.

**Mûsa Anter,** xortekî zîrek û jêhatî bû, xwîna kurdayetiyê di hiş û damarên wî de bi xurtî digeriya, têkoşîn ji bo azadiya kurd û kurdistanê armanca wî ya sereke bû. Ji bo vê armanca pîroz, di demên havînê de, ew derbasî binxetê dibû, bi kesayetiyên welatparêz re yên mîna **Kamîran Bedirxan, Osman Sebrî, Haco Axa, Emînê Ehmed**…hwd re hevaltî û dostanî daniye û bi hev re, komela rizgarkirina kurdistanê damezirandine. Ji bilî xebata rêzanî(siyasî) û ji ber giringiya rola zimên di xebata netewî de, **Mûsa Anter**, guhdaneke baş li zimanê kurdî kiriye, gelek pirtûk û gotar pê weşandine, ji wan: **Birîna Reş**(şano), **Ferhenga kurdî**, **Çinara min**, **Qimil**… û ji ber gotar û nivîsên xwe, pir caran ketiye zindanê, lê, tu carî, zindanê çavên wî ne şikandiye û xebata wî sist ne kiriye, bîr û baweriyên wî ne hejandine, her û her ew li ser rêya xebata netewî birêve çûye. Apî Mûsa, pirtûka xwe Birîna Reş di zindanê de nivîsandiye û ferhenga kurdî-tirkî ji 8000 peyvan amade dike.



Di destpêka salên 1960î de, ew di nava partiyên çep ên tirk de xebatê dike, di sala 1971 an de careke din ew tê girtin, sala 1976 an tê berdan, berê xwe dide gundê xwe heta sala 1989 an lê rûdine, sala 1989 an, dîsa berê xwe dide bajarê **Sitenbolê**, di gelek kovar û rojnameyan de dinivîse û dibe endamê partiya HEP ê ya legal. Roja 20ê Îlûna sala 1992 an, li Amedê, ji hêla hêzên ewlekariya dewleta tirkan ve tê kuştin û tevlî kerwanê şehîdên kurdistanê dibe, doza wî weke dozeke kujerê wê ne diyar tê qeydkirin.

Apê Mûsa, mirovekî hişmend, rewşenbîr û siyasetvan bû, di kêlîkên teng û dijwar de, giran û dûrbîn bû, peyvên wî pîvayî bûn, li hember neyarên gelê xwe bersivên wî herdem li ser lêvên wî bûn, bi tinaz û aqilmendî li wan vedigerand Nivîskar **Evdile koçer** di gotara **D.R ( 11)**

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurd.org